MEMÊ ALAN DERDIKEVE TÛRNEYÊ

# Bi Memê Alan sermest dibin



**Navenda Çanda Mezopotamya bi Koma Dansê ya Memê Alan xwe ji tûrneya Tirkiyeyê re amade dike. Koma Dansê ya NÇM'ê dê sahneya xwe ya yekemîn li Navenda Çandê ya Selahattîn Akçîçek pêşkêş bike**

*DESTANA* Memê Alan ku di wêjeya kurdî de cihekî taybet û girîng digire ji aliyê Koma Dansê ya NÇM'a Îzmîrê ve bû lîstik. Destana ku derhêneriya wê ji aliyê Hamîde Yuksel û koreografiya wê jî ji aliyê Rojîn Onurlu ve hatiye kirin cara yekemîn li Navenda Çandê ya Selahattîn Akçîçek derdikeve pêşberî temaşevanan. Destana Memê Alan ku bi sedsalan e bi riya dengbêjiyê heta îro hatiye, li NÇM'a Îzmîrê ji aliyê Koma Dansê ku ji 20 kesan pêk tê ve hate amadekirin... RÛPEL - 6

## CEJNA ZIMANÊ KURDÎ:

## Bernameya Kurd Derê ya cejnê



Serokê Kurd Derê Ahmet Aday, bernameya xwe ya li Enqereyê ya tekîldarî Cejna Zimanê Kurdî diyar kir û bang li hemû kesên di mijara ziman de bihîstiyar in kir ku tevli bernameyê bibin. Cejna Zimanê Kurdî ku ji aliyê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê ve di 2006'an de hat îlankirin wê bi çalakiyên cur bi cur bê pîrozkirin. Li Enqerê wê di çarçoveya Cejna Zimanê Kurdî de çalakiyên cur bi cur werin lidarxistin... RÛPEL -6



# Hawar

Rojnameya Rojane

14 Gulan 2009
Pêncşem
Sal: 1
Hejmar: 9
Buha: 50 Kr


Kurdî qedexe ye... R - 3

# Çav li Îmraliyê ne



**Piştî nîqaşên li ser çareseriyê û diyalogê niha çav li ser daxuyaniyên Lîderê PKK'ê Abdullah Ocalan in. Parêzerên Ocalan piştî nîqaşan di rojevê de cara yekemîn duh çûn Îmraliyê. Rewşenbîran jî xwest ku ev pêvajoya erênî neyê hingavtin û şensê ji bo çareserî û diyalogê bê bikaranîn**

### ERTUGRUL OZKOK XWESTIBÛ BIÇE ÎMRALIYÊ

Lîderê PKK'ê Abdullah Ocalan vê hefteyê dê ji bo atmosfera di çarçoveya nîqaşên ji bo çareseriya pirsgirêka kurd de derketine holê çi bêje, tê mereqkirin. Beriya ku naveroka hevdîtina Ocalan ya bi parêzeran re aşkera bibe, me notên hevdîtinê yên Ocalan ku piştî hilbijartinên 29'ê adarê pêk hatine vekolan û peyamên dayîn derxistin. Piştî rêzenivîsa nivîskar Hasan Cemal, Gerînendeyê Giştî yê Hurriyetê Ertugrul Ozkok xwestibû biçe Îmraliyê û bi Ocalan re hevpeyvînekê pêk bîne.

### 'HÛN XWE JI BO AŞTIYÊ AMADE BIKIN'

Piştî hilbijartinê yêkemîn notên hevdîtinê yên Ocalan di 3'ê nîsanê de bi raya giştî re hatin parvekirin. Di vê hevdîtina ku di 1'ê nîsanê de pêk hatîbû de peyama amadekariyên pêvajoyeke aştiyane dane. Ocalan gotibû heke dewlet bixwaze pê re diyalogê pêk bîne pêwîst e bi rengekî girêdayî hiqûqê û demokratîk xwe organîze bike. Ocalan ji bo diyalogê jî xwestibû merc bên afirandin û wiha gotibû: "Ku dewlet dixwaze li ser bingehê Komara Demokratîk pirsgirêkê çareser bike em dikarin guftûgo bikin."... *RÛPEL - 4*



## Ev çi nakokiya mezin e?

Wezîrê Karên Hundir Beşîr Atalay, li hemberî daxwazên ji bo navên gundan ên kurdî dîsa bên dayîn, got "Eger ji herêman daxwaz hebin, dibe. Ji bo çi dê nebe." Lê derket holê ku Dadgeha Îdarî birayara Meclîsa Giştî ya Bajar a Amedê ya ji bo li cem navên tirkî yên gundan ên kurdî jî bên nivîsîn bi hiceta "Navên kevn di nava gel de bi şiklekî ne fermî tên bikaranîn, eger ev biryar pêk bê dê hewesa ji bo bikaranîna navên berê bi pêş bixe" veto kir. Piştî Qeymeqamiya Kayapinarê navên wekî Roşna, Şîlan û Rojda ku Şaredariya Kayapinarê dane sê parkan red kirin, li Dadgeha Îdarî ya Amedê doz vekir... *R.3*

## Kê ji bo diyalog û çareseriyê çi got?

**Ji TESEV'ê Lêkolîner Dîlek Kurban:** Tişta herî bi wate ew e ku hikûmet bi DTP'ê re têkeve nava diyalogê. Ji bo PKK çekan deyne divê serastkirinên qanûnî yên teşwîk bikin bên çêkirin.

**Dadgerê Teqawît Albay Umît Kardaş:** Çareseriya pirsgirêka kurd û heta pirsgrêkên din jî dê bi makeqanûneke nû mimkûn be. Pirsgirêka kurd bi 2-3 guhertinên sembolîk çareser nabe.

**Parêzer Sezgîn Tanrikulu:** Daxuyaniyên ji aliyê Murat Karayilan ve hatine dayîn girîng in. Bi nirxandina lihevkirinê dê li hevkirina ji bo çareseriyê pêk bê. Bi vê yekê dê bingehê axaftinê bê avakirin.

**Prof. Dr. Mîthat Sancar:** Nîşaneke girîng a ji bo niyetê, gavên biçûk û jest pêwîst in. Divê rayedar niyeta xwe ya ji bo çareseriyê nîşan bidin.

**Prof. Dr. Dogu Ergîl:** Di pirsgirêka kurd de sendroma 'deja vu' ango ev tişt berê jî çêbûbû tê jiyîn. Berê tiştek çêbûye û ew tişt tim tê dubarekirin. *R.4*

## Jin hê jî li Helepçeyê reş li xwe dikin

*Dayikên Helepçê hê jî cilên reş li xwe dikin. 21 sal berê Rejîma Baasê li Helepçeyê 5 hezar kes kuştin û bi hezaran jî birîndar kirin. Yên ku di wê demê de biçûk bûn niha mezin bûne û fem dikin ka çima dayikên wan cilên reş li xwe dikin. Hemîdê 32 salî li bazara Altun ya Helepçeyê cil û bergên jinan difiroşe. Hemîd dibêje: 'Kêfa min ji cilên reş re tê û her cilên reş li xwe dikim. Reşpoşîn li vî bajarî, bi wê çîroka tehl û trajediya ku hatiye serê xelkê bajêr ve girêdayî ye."...* *RÛPEL - 7*



www.arsivakurdi.org

# Bi gotinên sergirtî çareserî nayê

SERCAN AYDIN

## Li Tirkiyeyê şertên çareseriyê amade bûne. Heke fermandarên kevin ên hêzên derya û bejahî û gelek generalên din dibêjin divê ev pirsgirêk were çareserkirin, tê wê wateyê ku şertên çareseriya demokratîk amade ne

Serokkomarê Tirkiyeyê Abdullah Gul li hewayê dibêje; pirsgirêka Tirkiyeyê ya bingehîn Pirsgirêka Kurd e. Tu kes nîn e nizanibe ku pirsgirêka Tirkiyeyê ya bingehîn pirsgirêka kurd e. Berî niha 50 salî Menderes jî berî ku bê darvekirin, li ser pirsekê gotibû; pirsgirêka Tirkiyeyê ya bingehîn pirsgirêka kurd e. Niha li kolanê, welatiyekî ji rêzê jî dibêje pirsgirêka Tirkiyeyê ya herî bingehîn pirsgirêka kurd e.

Têrênake ku bê gotin pirsgirêka Tirkiyeyê ya bingehîn pirsgirêka kurd e. Mafên gelekî yên neteweyî yên bingehîn ji aliyê dewletê ve jê hatine standin. Pirsgirêka Kurd pirsgirêka standina van mafan e. Ji ber wê bersivadayîna pirsa 'wê ev pirsgirêk çawa çareser bibe' girîng e.

Wê nasnameya vî gelî bi awayekî fermî bê qebûlkirin? Wê îradeya wî ya siyasî ya demokratîk bê qebûlkirin, bê naskirin? Wê perwerdeya bi zimanê dayîkê bê qebûlkirin? Heta ku pirsgirêka kurd qebûlkirina van mafan neyê qebûlkirin, wê tu wateya gotina 'pirsgirêka kurd heye' tunebe.

Serokkomarê Tirkiyeyê dibêje; ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê firset çêbûye. Serokfermandarê Tirkiyeyê jî wê rojê got; firseta tunekirina PKK'ê çêbûye. Em jî dibêjin firseta çareseriyê derketiye. Bi awayekî din di paşxistina çareseriyê de tu faydeya Tirkiyeyê nîn e. Ji ber wê ka ev gotina firsetê tê çi wateyê divê bê aşkerakirin. Tê dîtin ku firset cuda cuda tê şîrovekirin.

Serokfermandar dibêje; firseta tunekirina PKK'ê derketiye. Serokfermandar firseta operasyon û komkujiya siyasî ya li ser DTP'ê, weke firseta tunekirina Tevgera Azadiya Kurd datîne holê. Ji ber vê yekê divê serokkomar û hikûmet vê firsetê ne wekî firseta tunekirinê, bi gotin û helwestên xwe firseta çareseriya bingehîn deynin holê.

Berî niha bi deh rojan serokfermandar got; 'ji bilî hinek mafên şexsî tu mafên ku civakekê biafirînin nayên qebûlkirin. Serokfermandarê artêşê yê kevin, dibêje; 'wê PKK dev ji mafê perwerdehiya bi zimanê dayîkê bernede, wê bixwaze ku nasnameya kurd bikeve destûra bingehîn. Nirxandinên wisa kirin û got; 'ev nayên qebûlkirin.'

Heta ku gelê kurd weke civakeke cuda neyê qebûlkirin, heta ku weke îradeya siyasî ya demokratîk mûxatab neyên dîtin û heta perwerdeya bi zimanê kurdî neyê qebûlkirin, dê pirsgirêk çawa çareser bibe? Ev rastî tev pêwîst dibînin ku gotinên serokomar bên vekirin. Gotina 'pirsgirêka Tirkiyeyê ya herî bingehîn pirsgirêka kurd e' gavek e.

Pirsgirêka kurd ne tenê pirsgirêka Tirkiyeyê ya bingehîn e, çareserkirina vê pirsgirêkê di heman demê de şertê demokrasiyê yê jêneger e. Ji ber wê em nabêjin gotinên Abdullah Gul ne girîng in, lê em li bendê ne ku nava wan gotinan bê dagirtin. Lewre gelê kurd û hêzên demokratîk mafê wan heye ku biguman nêzîk bibin û vê bipirsin; gelo, ev mijûlkirin e an na.

Piştî 29'ê Adarê AKP lewaz bûye. Ji gelek aliyan ve bi ser de diçin. Ji ber wê ev tê bîra mirov; gelo dibe ji bo ku hikûmet nefesekê bistîne kurdan û hêzên demokratîk mijûl dike.

Ev aşkera ye ku heta niha di vê mijarê de gelek caran serî li xapandinên wiha daye. Herî zêde Tirkiyeyê ji vê zirar dîtiye. Ji ber vê eger çareserî pêk were, divê di vê mijarê de her tişt zelal be. Aşkera ye ku ji bo çareseriyê li Tirkiyeyê şert gihiştine. Dibe ku berî niha bi 10 salan, 20 salan bihata gotin; ji bo çareseriyê dem divê. Lê di roja me ya îro de kesê bêje civak ne amade ye dixwaze civakê bixapîne.

Eger fermandarên kevin ên hêzên derya û bejahî û gelek generalên din dibêjin divê ev pirsgirêk were çareserkirin, tê wê wateyê ku şertên çareseriyê amade ne. Gelek derdorên civakî jî difikirin ku pêwîst e pirsgirêk bê çareserkirin.

Belê, çawa ku em dibînin firset ev e.

Yên ku dibêjin pirsgirêka kurd heye û divê bê çareserkirin, divê bicesaret bin. Çawa ku yên dixwazin pirsgirêk çareser bibe difikirin ku cesaret ji vî karî re divê û divê gavên bingehîn bên avêtin.Abdullah Gul an jî kesên din, heke dixwazin piştgiriyê ji gelê kurd û ji hêzên demokratîk bigirin, divê aşkera biaxivin û bicesaret bin. Divê ne ji bo mijûlkirin û xapandin biaxivin, divê nîşan bidin ku xwediyê îradeya çareseriyê ne.

Li Tirkiyê kîjan hêz an kesayet îradeya çareseriyê derxe holê wê piştgiriyeke mezin bistîne. Eger bi awayekî aşkera ji gelê Tirkiyê re bêjin pêwîst e ev pirsgirêk bê çareserkirin, kesên di vê mijarê de xwe bidin pêş wê ji gelê Tirkiyê jî piştgiriyê bistînin. Yên nexwazin pirsgirêk çareser bibe wê bandora wan tinebe. Lêbelê heta ku ne bi cesaret bin û eşkere neaxivin, yên çareseriyê naxwazin wê serdest bibin û wê gavan bi paş ve bidin avêtin.

Yên ku nikaribin piştgiriya civakê û hêzên demokratîk bigirin nikarin vê pirsgirêkê çareser bikin. Yên vekirî neaxivin nikarin vê pirsgirêkê çareser bikin. Di mijara pirsgirêka kurd de, yên vekirî biaxivin, wê kelemên lê pêşiya xwe yên hundir û derev jî di rojekê de ji holê rakin.

Yê ku bêje ezê pirsgirêka kurd çareser bikim, ne yek ji 100 mezinên tirkan, wê bibe yek ji 5 mezinên tirkan. Eger îro ji Ozal tê heskirin, ji ber cesareta wî ya di pirsgirêka kurd de ye. Abdullah Gul an jî yên din yên dixwazin pirsgirêkê çareser bikin bila netirsin. Eger vekirî bin wê piştgiriyê bigirin, eger ne vekirî bin, nikarin tu gavan biavêjin.

Hin dibêjin; eger em di pirsgirêka kurd de gavên bingehîn biavêjin, wê civaka tirk li hemberî me derkeve, ev ne rast e. berevajiyê wê, yê bêje ezê pirsgirêka kurd çareser bikim, li Tirkiyeyê dê bibe lîderê siyasî yê herî mezin. Wê Deniz Baykal jî û yên din jî werin ser rê.

Tişta pêwîst tenê ew e ku vê pirsgirêkê nekin pirsgirêka partiyekê û bi taktîkî nêzîk nebin. Bêguman yên taktîkî nêzîkî vê pirsgirêkê bibin, yên ji bo berjewendiyên siyasî nêzîk bibin û hedefa wan xapandin be, wê di vê pirsgirêkê de piştgiriyê negirin.



TEKÎN (Şaban TEMEL)



HARÛN (Melek TEMEL)



DEVRÎM (Ekrem TEMEL)



MIHYEDÎN (Mehmet TEMEL)



ROJHAT (Ayhan TEMEL)

**BÎRANÎN**

**Beriya ku welatê min bibe dojeh misteke bihuştê bû.**
**Ji kaniyên wê aveke zelal diherikî..**
**Û zeviyên wê heşîn bûn...**
**Dema ku li her derê tofan radibû...**
**Hûn dijminên tariyê û dostên ronahiyê bûn.**

***Tekîn bû pêşengê we û we hemûyan da ser riya wî ya ronî...***
***Em we gulên azadiyê bi dil û can bi bîr tînin...***

**Li ser navê malbatê Saîme, Ahmet, Narîn, Melezxan, Esat û Mîkail**



BAGER (Nusret TEMEL)

## Deng

# Îran li dijî diyalog û çareseriyê ye

tayiptemel@walla.com TAYÎP TEMEL

Li her çar parçeyên Kurdistanê û li Rojhilata Navîn nîqaşên li ser pirsgirêka kurd cudatir û dewlemendtir dibin. Her alî ji hêla xwe ve dixwaze mohra xwe li vê pêvajoyê bide. Tirkiye ji çar aliyan ve hewl dide ku li ser pirgirêka kurd û rewşa PKK'ê hevdîtinan pêk bîne. Ji bo vê yekê mekanîznameyek bi navekî nû ava kir.

Ew hevdîtin nîşan didin ku edî pirsgirêka kurd tenê Tirkiyeyê eleqedar nake û hemû hêzên li Rojhilata Navîn hesaban dikin ji nêz ve eleqedar dike. Hebûna PKK'ê û têkoşîna wê bi taybetî jî herî zêde bandorê li ser siyaseta Amerîkayê dike.

Lê hin têkiliyên balkêş hene di nava hin dewletan de hene. Yek ji van dewletan Îran e. Dema li Tirkiyeyê hewayê aştî û biratiyê hindik be jî pêk tê û nîqaşên çareseriya bi diyalog û demokrasiyê derdikevin pêş, helwesta Îranê diguhere. Îran yekser dixwaze şer û pevçûnên di navbera Tirkiye û PKK'ê de zêde bibin. Mînaka herî dawî di roja ku Serokkomar Gul peyamên êrênî dan de Artêşa Îranê Colemêrg da ber topan. Topebarana gund û bajarokên Colemêrgê ji aliyê Artêşa Îranê ve ne tesadûf e û ne jî encameke şaştî û xeletiyekê ye. Ew dem û wext pir bi zanebûn hatiye tercîhkirin.

Wekî ji berê de tê gotin ku çareseriya Pirsgirêka Kurd li Tirkiyeyê di warê êrênî û neyînî de bandorê li ser polîtîka û siyaseta gelek dewletên cîran jî dike. Heta niha Amerîkayê dixwest li ser esasê Pirsgirêka Kurd ji Tirkiyeyê tavîzan bistîne. Heta mirov dikare bibêje ku Amerîkayê destûr nedida ku Pirsgirêka Kurd li Tirkiyeyê bê çareserkirin. Wekî tê zanîn gelek nîqaş li Tirkiyeyê li ser Pirsgirêka Kurd çêbûn.

Aşkera ye ku ne hêzên biyanî û ne jî Îran, naxwaze ku însiyatîfa çareseriya Pirsgirêka Kurd bikeve destê kurdan û Tirkiyeyê. Ew dixwazin ku vê pirsgirêkê wekî mijara şantajê û kartekê di destê xwe de bigirin. Di dema borî de gelek caran derket holê ku Tirkiye jî naxwaze ku însiyatîfa çareseriya Pirsgirêka Kurd bikeve destê Îranê. Her du dewletên navborî jî ji bo neçareseriya pirsgirêkê di nava pêşbaziyeke mezin de ne. Heke yek bixwaze çareser bike jî, ya din dibêje çareser neke. Dema nîqaş li Tirkiyeyê li ser çareseriya Pirsgirêka Kurd çêdibin, Îran dibêje ez amade me ji bo ku alîkariyê bidim te, ji bo şerê te yê li dijî PKK'ê. Bi vê gotina xwe dest bi êrîşan dike û baweriyê dide Tirkiyeyê ku ew bi piştgiriya Îranê dikare bi ser hêzên PKK'ê de biçe û bi vî awayî encamê bigire.

Dewleta Îranê xwedî kevneşopiyeke kûr a siyasî ye. Ew jî ji berê de dixwaze kurdan bike mijara bazarê li hemberî Tirkiyeyê û bi vî rengî îtîfaqên nû ji xwe re çêbike. Her wiha Îran di warê dîplomatîk de bi Çîn û Rûsyayê re têkiliyên xurt dimeşîne. Îran dixwaze ji nakokiyên di nava Rûsya, Ewropa û Amerîkayê de sûdê werbigire û her wiha dixwaze bi Rûsya, Çîn û Hindistanê re blokeke li gorî xwe çêbike.

Armancake din a esasî ya siyaseta Îranê jî ew e ku dixwaze li ser kurdan bazarê bi Tirkiye û hêzên din re bike. Kurdan ji xwe re dike amûrê bazarê.

Heke ji ber vê yekê jî be divê rayedarên Tirkiyeyê û derdorên demokrat û aştîxwaz baş bizanin ku dema çareseriyê û diyalogê hatiye û derbas jî bûye. Heke ev yek neyê kirin dibe ku Tirkiye însiyatîf û şansê ketiye destê wê dîsa winda bike.

**HAWAR**
**Aram Basın Reklam ve Yayıncılık Tic. San. Ltd. Şti.**
Adına İmtiyaz Sahibi ve Sorumlu Yazı İşleri Müdürü
**Bedri ADANIR**
***Adres:*** Kooperatif Mahallesi Gevran Caddesi 1 Geçit. Sarıoğlu Apt. Kat: 4 No:14 Ofis Yenişehir - Diyarbakır
***TEL:*** 0 (412) 229 00 30
***Fax:*** 0 (412) 229 00 39

Baskı ***(ÇAP):***
***Stenbol:*** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A Sefaköy - Küçükçekmece İstanbul
***Tel:*** 0 (212) 580 63 80
***Edene:*** Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş İstîklal mah. İstîklal. Cad. ***No:*** 44 Seyhan Edene
**Yayın Türü:** Süreli

www.arsivakurd.org

# Riyên pêşketina wêjeya kurdî -I-

Îro gelek lêkolîn û gotarên der barê wêje û nivîskariya kurdî de li holê ne. Her mijareke her nivîsekê di cihê xwe de xwedî nirxek e. Her xwêdanek û her gotarek ji hêla xwe ve pirsekê yan komeke pirsan hiltîne û li gorî zanebûn û derfetên xwe yên zanistî wan rave dike. Heta heke hinek pirs ji ber dijberiyên xwe neyên pejirandin jî dîsa ew bi tomeriya nakokiyên xwe ve dibin bingeh, ku mirov gotûbêjan bidomîne û rastiyê derxîne holê...

Gotûbêj bi gotûbêjan, lê mabesta me li vir tiştekî din e! Ya ku em di vê gotarê da dixwazin li ser biaxivin, ew pirsa wêjeyê bi giştî ye û di nav wê da jî pirsa taybetmendiyên avabûn û pêşketina wêjeya kurdî, riyên wê yên ber bi xwedîtin û xweguhartin û nûjenbûnê ve. Em ê hewl bidin di nav çarçoveya pêşketinên civaka kurdî de li ser avabûn û pêşketina wêjeya kurdî dîtinên xwe bi giştî bînin ziman.

Di dawiyê de em ê li ser rewşa wêjeya kurdî ya vê serdemê, zimanê wêjeyî û weşana pirtûkan jî rawestin.

***

Dema li ser wêjeya kurdî tê axaftin divê bê zanîn ku ew wêjeya gelekî bindest û qedexe ye. Ku çawa hêzên dagirker û serdest xwestine gelê kurd tune bikin, wisa jî her tişt kirine ku wêjeya wî wek wêjeyeke neteweyekê negihîje. Rastir dibû heke mirov bigota, ewan her tişt kirine û îro jî dikin, ku wêjeya kurdî çênebe û pêşnekeve. Wan hewl daye, ku hê di colangê de wê bifetisînin. Ji ber ku wekî ziman bingeha nasnameya neteweyî ye, wêje jî şêwazekî pêkanîna nasnameyê ye di jîyanê da. Wêje eynika pêşkevtin û dînamîka civakê ye- bi hêlên wê yên erênî û neyînî ve. Ew hêmanek e, bi kîjan neteweyê dîtin, raman û nirxên xwe yên jiyanê, hest û ramanên xwe bi hunera wêjeyê tîne ziman û bi wî awayî xwe baştir nas dike, dide nasandin û di civaka mirovayîyê ya giştî da netewebûna xwe diparêze û dide pejirandin.

Her çiqas jî em dikarin bibêjin, di dema xwe da serbilindîyên neteweyî yên wekî; Melayê Batê, Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Ahmedê Xanî, Goran, Cegerxwîn û yên wekî wan ji nav gelê me derketine, dîsa jî ji bo xatirê rastiyê, divê bê gotin ku


Ezîzê CEWO

wêjeya me wekî şêwazekî mitalekirina (ramankirin) civakî nivîşkan û lewaz maye. Û ev jî wek ku me li jorê jî got ji ber wê ye ku hêzên dagirker û serdest hemû riyên pêşkeftina civakî li ber gelê me girtine. Ji ber ku gelê me bi xwe bindest bûye, raman û wêjeya wî nikaribûye azad be. Û heke ji nav gelê me heçeyên(1) wêje û ramanê yên mezin derketine, wan wekî volkanekê dane der. Ewan ji bin derxûn(2), ber û zinaran, ên ku dijmin danîbûn ser devê beroşa raman û mitala me, bilqîn kirine û derketine ronahiyê. Û eger ew mezinahî, yên ku me li jor gotin, derketin jî tu derfet û rê ji bo wan venebûne, ku ew bibin hebûna civaka giştî ya mirovahiyê. Ev demek e dirêj e ji gelê kurd û cîhanê veşartî bûne, wek wan zêr û kevirên qîmetî, yên ku bi sedsalan di bin axê de mane.

Em îro dikarin bibêjin, ku heta nîveka sedsala XX'an ku navê wan mezinên me dizanibûn (an bihîstibûn), mirovê bikaribûya li ser tilîyên desteki bihejmarta. Û ji ber ku di nav civaka kurdî de tu kesî nikaribû bi zimanê dayikê û li ser bingeha çand û wêjeya neteweyî perwerdeya xwe destbaniya, gelek lawên gelê me, yên ku perwerdehiya xwe bi zimanên biyanî dîtine, bûne hebûn û serbilindiya neteweyên din (Baba Tahir, Nîzamî, Ahmed Şewqî, Yaşar Kemal, Selîm Bereket û gelekên din). Di dema xwe da Rojhilatzanê Soviyetî yê Mezin Îosîf Orbêlî hê di nîveka sedsala XX'an de nivîsiye ku gelê kurd keda xwe kiriye nav xezîna şaristaniya cîhanî ku vî gelî di bin navê îraniyan (farizan), tirkan, ereban, ermeniyan de gelek lawên xwe, yên wekî helbestvan, sazbend (mûzîsîan), serleşker ên bi nav û deng winda kirine û yên ku îro dîroka wan gelan dixemilînin.

Belê, gelê kurd keda xwe kiriye nav xezîna şaristaniya cîhanî. Belê, gelek lawên wî dîroka gelên cînar dixemilînin, lê dagirker û serdestan bi her awayî rê li pêşiya wan girtine ku ew nikaribin bi zimanê xwe, li ser bingeha çand û hunera neteweyî pêş bi kevin, ji ber ku bi tevî vê jî gelê kurd di nav xwe da hêz û derfet dîtine,ku raman û giyana neteweyî di nav wî de venemire. Dibe ku ev bi tevgerî nebûye jî, lê di bingeha xwe ya xwezayî da çand û hunera gelê kurd ew qasî bi hêz e ku qedexe û tevkujiyê nikaribûne rê li pêşiya rûdana çandî û hunerî bigirin.

Dagirkeran wêjeya nivîskî qedexe kirine, gelê kurd ya zarkî kiriye alternatîf, û bi zargotina gelêrî ra tevayî gelek helbest û destaneyên helbestvanên kurd ên sedsalên navîn bi zarkî di nav gel da geriyane (parçeyên destana helbestvanê bênav yê sedsala VII, Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî û yên din).

Di rewşeke wiha da wêjeya kurdî, bi wateya peyva Wêje ya tam, nikaribû bighişta wê astê, ya ku ji bo neteweyekê tê xwestin. Lê ew toxim û zîl, ên ku di nava sedê salan da hatibûn reşandin û gihandin, bûn bingeh, ku di sedsala XX'an de wêjeya kurdî ji nû ve vedijîne. Guhertinên di cîhanê de û pêla tevgerên azadîxwaz ên kurdî bi xwe re pêwîstiya ji nû ve xwendin û li gorî serdema nû watedarkirina afrandinên klasîkên wêjeya kurdî derxistin holê. Û dîsa jî ji ber ku di welatê me de her tiştê me yê neteweyî bi astengî û qedexeyan re rûbirû bûn, dawiya sedsala XIX'an, destpêka sedsala XX'an zanista der barê kurd û Kurdistanê de, wêje û çapemeniya kurdî li derveyî welat riyên pêşketinê geriyan (Bexda, Yêrîvan, Qahîrê, Moskova, Roma, Sankt- Pêtêrbûrg, Şam û yên din)...

**JÊRENOT:**

**(1) Heçe**: Serê çiyayê bilind. Yê ku sal- dimdêre bi berfê pêçayî ye û di nav ewran de winda dibe û her kes nikare xwe bigihîne wan bilindayan. A ji wan mirovan re, yên ku di nav zanist, wêje, çand û hunerê da digihîjin destanînên mezin û bilind, bi wateyî dibêjin Heçe, ango, bilindayiya ku ji her kesî nayê xwe bigihînê.

**(2) Derxûn:** Devgîrk (qalpax) ê dizane ji xweliya kaxçîn çêkirî.

## HÊVÎ Û EVÎN

*An jî dildarî ne tiştekî hêsan e*
*ku mirov bikare bitehmîne an bide*
*tehmandin*
*ne hêsan e hezkirin lewre bi her awayî*
*hezkirin dixwaze bîr û bawerî*
*fedakarî wêrekî û dilawerî*
*vînek azad û dilek bêhêz û rûmetî*
*rastî û duristî*
*dilsozî û hezkirina apovanî*
*berî her tiştî ked û hewl û tehb dixwaze*
*ne hêsan e şexsiyetek sayanî*
*her kes nikare hez bike bi evîn û evîndarî*
*xwezî tu bana şayanê hezkirinê*
*belê, mirovê hezkirinê*
*xwezî min jî bizaniba*
*riya baxê evînê*
*dema ez ji çavên wî dipirsim*
*destê wî diricifîn*
*hestên wî difûrin*
*xweziya wî naçe xwarê*
*û dengê wî dilerize*
*di nava dilê xwe de dikelim*
*hêsirên dilê min mîna peşkên barana biharê*
*hûr hûr diniqutin ser birîna dilê min*
*dergûşa jiyanê di nava reşbîniya min de*
*bilûra tenêbûnê*
*poşmanî ye lorîna min, dizanim*
*ne evîn e her hezkirin*
*dîsa jî daxwaziyeke ji dilê min*
*evîneke şayanî*
*apovanî ji çavkaniya min*

**HACER XELîL YUSUF**




balekani@hotmail.com
Îkram BALEKANÎ

## Dinyaya Kurdan

Dinyaya kurdan ger we bala xwe dabê, em gelek caran ji bo rewşa hewayê gotina "Dinya" yê bi kar tînin. Wekî mînak em dibêjin: "Dinya pir xweş e, dinya pir germ e, dinya pir sar e û hwd." Heyran ma em li ber tenûrê rûniştibin,emê ji ku bizanin dinya germ e yan sar e? Gelo nebe ku germa tenûrê zêde ye û em meselê zêde mezin dikin! Yan jî di dinyaya xwe ya "biçûk" de em zêde xwe mezin dibînin û texmîn dikin ku em bûne "Saziya Metrolojiyê" ya cîhanî! Yan jî em di guhê ga de razane û haya me ji cîhanê nîn e. Em texmîn dikin cîhan hemû li derdora me dizivîre û gundê me cîhan e. Gelo bi rastî cîhan ew qas biçûk e yan jî em ew qas mezin difikirin! Gelo terîmeke din tuneye ku em bi kar bînin? Qey gotin nemane? Welhasil ji bilî me, tu kes ji bo rewşa hewayê "Dinya"yê bi kar nayîne. Balkêş e, em dibêjin dinya ewr e, dinya sahî ye, lê dema berf an baran dibare, em nabêjin "Dinya dibare". Em dibêjin baran dibare yan berf dibare. Lê dîsa em nexwazin em dikarin terka gotina dinyayê nekin, emê bêjin "dinya baranî ye"...

Çi dibe bila bibe, gotina "dinya" xweş e. Ji bo ku em neşibin gel û neteweyên li derdora xwe divê em bi kar bînin.

Di hêla 'sosyolojîk' de ev pêşketineke baş e. Kurd bi dinyaya xwe razî ne û cihê ku lê dimînin bi qasî cîhanekê qebûl in û jê hez dikin.

Wekî hûn dizanin bi dehan sal in ku zimanê kurdî hatiye qedexekirin.


Heta li Tirkiyeyê dihate gotin ku zimanekî wisa tuneye û dest bi gotina çîrokan dikirin. Sedemeke bingehîn a ku neteweyan ji hev cuda dike, ziman e. Lê qaşo lêkolînerên tirk digotin, kurdî ne serbixwe ye. Çawa ne serbixwe ye! Wele evqas serbixwe ye, heta tiştên di nava zimanê kurdî de di nava ti zimanên cîhanê de tunene. Me li jorê jî mînaka wê dît.

Ger bê bîra we ku sedîsed tê bîra we, 14, 15 û 16'ê gulanê rojên cejna zimanê kurdî ne. Jixwe bi vê yekê jî em îsbat dikin ku kurd û zimanê kurdî ji neteweyên din cudatir in. Heyran li hemû cîhanê rojekê cejnê pîroz dikin. Lê kurd, çil roj û çil şevan dawetê dikin, 7 rojan cejnê pîroz dikin, 25 rojan Newrozê pîroz dikin, hefteyekê 8 Adarê pîroz dikin, nizanim çi û çidikin! Niha jî 3 rojan cejna ziman pîroz dikin. Ez bawer im mirov bide ser hev û hesab bike, wê sal ji bo me deyîndar derkeve û têra pîrozbahiyên me nake. Ma êdî em çi bikin û çawa nîşan bidin ku ji gelên din cudatir in!

Ez bawer im dinya sar e, wê berf bibare ser dawiya nivîsa min...

HAWARA EYŞO

SÊLA SOR A EYŞO




HER TIŞT QEDIYA MA ŞERÊ DÎKAN




ŞÎDETA LI DIJÎ ZAROKAN



KURMÊ DARÊ



www.arsivakurdi.org

# Ji zarokan daxwaza zimanê zikmakî

**Zarokên kurd destnîşan kirin ku ji ber ew bi zimanê dayikê bi hêsanî xwe tînin ziman, daxwaza perwerdehiya bi zimanê dayikê dikin. Civaknas Gulistan Akel da zanîn ku zarok dema bi zimanekî biyanî perwerdehiyê dibînin derûniya wan xira dibe**

Zarokên êlihî, diyar kirin ku ew herî zêde xwe bi zimanê dayika xwe bi hêsanî tînin ziman û xwestin bi zimanê dayikê perwerdehiyê bibînin. Civaknas Gulistan Akel jî diyar kir ku zarok bi zimanê zikmakî civaka xwe nas dikin û bi zimanê zikmakî teşe digirin.

Zarokên êlihî ku bi salan e ji ber çewisandin û pişaftina pergala dewletê nikarin bi zimanê xwe perwerdehiyê bibînin, xwestin bi zimanê zikmakî perwerdehiyê bibînin. Zarokan bal kişand ser nakokiyên Hikûmeta AKP'ê û gotin ku li aliyekî TRT 6 weşana kurdî dike û li aliyê din nikarin bi zimanê dayikê perwerdehiyê bibînin. Zarokê bi navê Ahmet Akbulut ku diçe pola 6'emîn, destnîşan kir ku zimanê wan bi kurdî ye û perwerdehiya wan bi tirkî ye. Akbulut, diyar kir ku ji ber ew bi zimanê biyanî perwerdehiyê dibînin pir zehmetiyê dikişîne û di dersên xwe de ne serkeftî ye.

**'Min qet tirkî nedizanî'**

Xwendekarê bi navê Cuma Alokmen ku diçe pola 9'an jî da zanîn ku ew bi diya xwe, bavê xwe û derdorê xwe re bi kurdî diaxivî û bi tirkî nizanîbû. Alokmen wiha axivî: "Dema ez çûm dibistanê ez rastî zimanekî biyanî hatin. Min qet bi zimanê tirkî nizanîbû. Her tişt bi min xerîb dihat. Ji ber ku ez bi tirkî nizanibû di polê de her dem ez bêdeng dimam. Vê yekê derûniya min xira dikir. Min pir zehmetî û dijwarî dikişand. Ji ber ku min bi zimanê tirkî nizanîbû û dersên min xirab bûn min nedixwest ez biçim dibistanê. "Xwendekarê bi navê Diyar Okan ku diçe pola 6'an jî got ku ji ber gelek caran ew li sinifê bi kurdî axiviye, rastî neheqiyan hatiye.

**Bandorê li ser derûniyê dike**

Civaknas Gulistan Akel jî da zanîn ku ji avabûna komarê heta îro li Tirkiyeyê ziman têne qedexekirin. Akel, bal kişand ser gelek welatên Ewropayê û diyar kir ku li welatên Ewropayê bi gelek zimanan perwerdehî tê dayîn. Akel wiha got: "Li Swêdê li gorî îstatîstîkên salên 2002 û 2003'yan 138 komên bi zimanên cuda diaxivin hene. Ji vana 112 kom bi zimanê dayikê perwerde dibin. Zimanê dayikê li ser kesayetiya zarokan bandoreke mezin çêdike. Zarok dema bi zimanê biyanî perwerde dibînin derûniya wan xira dibe û kesayetiya wan xira dibe. Tenduristiya wan xira dibe. Li Tirkiyeyê zarokên kurd heta 7 salî zimanê dayikê fêr dibin û diaxivin. Piştî 7 saliya xwe jî li dibistanê fêrî zimanê tirkî dibin. Ev yek li dijî zanist û pergala perwerdehiyê ye. Divê ev yek bê serastkirin." Akel, anî ziman ku zarok bi zimanê dayikê xwe û civaka xwa nas dikin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Li Tirkiyeyê ji xeynî zimanê tirkî hemû zimanên din qedexe ne. Ev yek jî gelek pirsgirêkên civakî û derûnî bi xwe re tîne. Divê her kes bi zimanê xwe perwerde bibîne. Ev yek hem ji bo tenduristiya kes û hem jî ji bo tenduristiya civakê pir girîng e." **ÊLIH / DÎHA**



## Bernameya Kurd Derê ya Cejna Zimanê Kurdî

Serokê Kurd Derê Ahmet Aday, bernameya xwe ya tekîldarî Cejna Zimanê Kurdî diyar kir û bang li hemû kesên di mijara ziman de bihîstiyar in kir ku tevli bernameyê bibin.

Cejna Zimanê Kurdî ku ji aliyê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê ve di 2006'an de hat îlankirin dê bi çalakiyên cur bi cur bê pîrozkirin. Li Enqerê dê di çarçoveya Cejna Zimanê Kurdî de çalakiyên cur bi cur werin lidarxistin. Di 15'ê meha gulanê de bi pêşengiya TZPKurdî dê pîrozbahiyên Cejna Zimanê Kurdî li saziya Kurd Derê dest pê bikin. Di 16'ê gulanê de jî nivîskar Selîm Temo, parlamenterên DTP'ê Hamît Geylanî, Osman Ozçelîk û zimanzan Zulkuf Ozkan (zaravayê dimilkî) dê li salona ÎMO panela bi mijara "Dewlemendiya kurdî" bê lidarxistin. Di çarçoveya pîrozbahiyên Cejna Zimanê Kurdî de KURD DER di 21'ê gulanê de dê listika koma şanoya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê ya bi navê "Mala Dînan" li Navenda Hunera Ekînê li dar bixe. Serokê Kurd Derê Ahmet Aday, bang li kesên ku di mijara kurdî de bihîstiyar in kir ku tevli bernameya wan bibin. **ENQERE / DÎHA**

## Li Eskîşehîrê ji ciwanên YDG-M'ê xebata 'kurdî'

Ciwanên endamên Meclîsa Ciwanên Demokratîk û Welatparêz (YDG-M) a DTP'ê yên Zanîngeha Anadoluyê di bin navê Yekîneya Çand û Hunerê de bi slogana, "Hişmendiya hevpar a kurdan" bi armanca pêşvebirina zimanê kurdî xebatên ziman, muzîk, sînema û şanoyê dimeşînin.

Ligel zordariyên li ser ziman û çanda kurdî jî ciwanên kurd hewl didin çanda xwe dewlementir bikin. Ciwanên YDG-M'ê yên xwendekarên Zanîngeha Anadoluyê di bin navê Yekîneya Çand û Hunerê de bi slogana, "Hişmendiya hevpar a kurdan" xebatên ziman, muzîk, sînema û şanoyê dimeşînin. Ciwanên atolyeyên muzîk, wêje, sînema û şanoya kurdî vekirin, bi armanca zimanê kurdî hîn bibin dest bi kursa kurdî kirin. Ciwanên panelên têkildarî çanda kurdî jî amade dikin, li ser mîtolojî û felsefeya bi kurdî jî lêkolînan didomînin. Ciwanên van xebatên xwe bi komîsyonan dimeşînin, dixwazin di hemû qadan de kurdî û çanda kurdî bi pêş bixin.

**Çandeke dewlemend e**

Ji xwendekaran Ethem Çakir got ku heta niha kurdologên ne kurd li ser çanda kurdan xebat meşandine û wiha got: "Van kesan heyraniya xwe ya li hemberî çanda kurdî her tim aniye ziman. Divê em jî êdî vê çanda dewlemend biparêzin û pêşve bibin. Ji bo vê wezîfeyeke mezin dikeve ser milê ciwanên kurdan." Çakir diyar kir ku xebatên wan li ser esasê dilxwaziyê dimeşin û wiha domand: "Bi niqaşan û hilberînê em çanda xwe hîn dibin. Piştre me Yekîneya Çand û Hunerê ava kir, berî her tiştî me dest bi vekirina atolyeyan kir. Li ser ziman, çand, dîrok, muzîk, sînema û şanoya kurdî me atolye vekirin." **ESKÎŞEHÎR / DÎHA**

## Hejmara *Tîroj* a nû derket

Kovara çand û hunerî Tîroj ku du mehan carekê derdikeve, hejmara gulan-hezîranê bi mijarên balkêş derxist.

Di hejmara kovara Tîrojê ya meha gulan-hezîranê de jî pênûsa Yucel Sarpdere bi sernavê, "Hilbijartina kurdan" dosyayek cih digire. Her wiha Erdogan Aydin, Yuksel Genç, Vahap Coşkun, Ahmet Yaşaroglu û Sîbel Ozbudun bi nivîsên xwe encamên hilbijartina 29'ê Adarê bi berfirehî dinirxînin. Karîkatura Halîl Încesu li ser lêdana zarokê li Colemêrgê çêkirî jî balê dikişîne. Her wiha gelek nivîsen din ên li ser çand û hunerê di kovarê de cih digirin. **STENBOL**




## *'Memê Alan' derdikeve tûrneyê*

Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) bi Koma Dansê ya Memê Alan xwe ji tûrneya Tirkiyeyê re amade dike. Koma Dansê ya NÇM'ê dê sahneya xwe ya yekemîn li Navenda Çandê ya Selahattîn Akçîçek pêşkêş bike û piştre jî li gelek bajaran derkeve pêşberî şanohezan.

Destana Memê Alan ku di wêjeya kurdî de cihekî taybet û girîng digire ji aliyê Koma Dansê ya NÇM'a Îzmîrê ve bû lîstik. Destana ku derhêneriya wê ji aliyê Hamîde Yuksel û koreografiya wê jî ji aliyê Rojîn Onurlu ve hatiye amadekirin cara yekemîn li Navenda Çandê ya Selahattîn Akçîçek derdikeve pêşberî temaşevanan. Destana Memê Alan ku bi sedsalan e bi riya dengbêjiyê heta îro hatiye, li NÇM'a Îzmîrê ji aliyê Koma Dansê ku ji 20 kesan pêk tê hate amadekirin. Berhema destana Memê Alan ku ji aliyê çand û folklorê ve pir dewlemend e, ji aliyê kurdolog Roger Lescot û alîkariya Celadet Bedirxan wergerî zimanê fransî hate kirin û li Lubnanê hate weşandin.

**Bi her kesî bidin nasandin**

Derhênera lîstikê Hamîde Yuksel, diyar kir ku Destana Memê Alan ji aliyê paşeroja çanda kurd ve çavkaniyek pir dewlemend e û wiha got: "Li Mezopotamyayê çand, wêje û folklora gel ji aliyê pergalê ve hate windakirin û înkarkirin. Lê, em dixwazin bi vê xebatê dîsa wê dewlemendiya Mezopotamyayê derxin holê û zindî bikin." Koreografa lîstikê Rojîn Onurlu jî diyar kir ku ekîbê wan ji 20 kesan pêk tê û wiha got: "Piştî em pêşandana lîstikê li Îzmîrê pêşkêş bikin, em ê derkevin tûrneya Tirkiyeyê."

Lîstikvanê ku rolê Mem dilîze Sedat Çoban jî daxuyand ku gelê Mezopotamyayê li gel hemû înkar û îmhayê çanda xwe heta îro zindî hiştiye. Çoban, destnîşan kir ku divê karakterê Mem wekî serhildana li hemberî înkarê bê dîtin û wiha got: "Mem li hemberî asîmîlasyonê têkoşîn daye. Divê bi taybetî kesên koçber bûne, destana Memê Alan ji bîr kirine. Armanca me em kurd û hemû mirovên têne çewsandin bi nirxên wî re binin cem hev." **ÎZMÎR / DÎHA**



## Li Amedê Rojên Fîlman

Li Amedê di navbera 15 û 17'ê gulanê de "3'yemîn Rojên Fîlmên Navneteweyî" dê bê lidarxistin. Di rojên filman de dê 40 fîlm ji sînemahezan re bêne pêşkêşkirin.

3'yemîn Rojên Fîlmên Navneteweyî bi hevkariya DSM, Klûba Sînemayê ya Amedê, Walîtiya Amedê, Odeya Dermanfiroşan, Odeya Bazirganî û Pîşesaziyê û Gun TV'ê pêk tê.

Navenda Hunerê ya Amedê (DSM) bi daxuyaniyeke nivîskî der barê "3'yemîn Rojên Fîlmên Navneteweyî" de agahî dan. Di daxuyaniyê de hate gotin ku 'Sînemaya Avrupayê' ya girêdayî DSM'ê ji roja hatiye damezirandin heta îro hunermendên herêmî, neteweyî û navneteweyî bi gelê Amedê daye nasîn. Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku li Amedê di 2 salên dawî de nêzî 50 fîlm û belgefîlm hatine afirandin. Di berdewama daxuyaniyê de wiha hate gotin; "Armanc ew e ku sînemavanên herêmî bigihin hev û berhemên wan bên pêşkêşkirin. Di 2007'an de di Rojên Fîlman de 52 fîlm hatibûn nîşandan. Di sala 2008'an de nêzî 4 hezar kesî fîlm temaşe kiribûn. Îsal nêzî 40 fîlm dê ji bo temaşevanan bên pêşkêşkirin." **AMED / DÎHA**

www.arsivakurd.org

# Ji bilî karê xwe hemû karan dikin

Di Hefteya Hemşîreyan de rewşa hemşîreyan ku gelek caran li gorî pîşeya xwe nayên wezîfedarkirin, hate nîqaşkirin. Hemşîre ji bilî tedawî û xwedîkirina nexweşan, wezîfeya dermanfiroşî, îstatîstîkvanî û di depoyan de têne wezîfedarkirin

**A. Can DEMÎR** – ÎZMÎR / ANF

Hemşîre ji bilî karê xwe bi hemû karan re mijûl dibin. Hemşîre gelek caran karê îstatîstîkvanî, dermanfiroşî, personeliya teknîkî û berpirsiyara depoyê jî dikin. Nezelaliya karê wan û xebata bi peyman, ewlehiya wan a kar dixe nava xetereyê.

Nurşen Coşkundemîr di sala 1995'an de di Nexweşxaneya Lêkolîn û Perwerdehiya Welidîna Jinan a Zanîngeha Egeyê de dest bi hemşîretiyê kir. Li Bursayê 9 salan xebitiye û li Bursayê di Şaxa Sendîkaya Kedkarên Xizmeta Civakê û Tenduristiyê de wekî endama lijneya rêveberiyê xebitiye. Di dema nobedariyê de Çoşkundemîr li ser pîşeya hemşîretî, xebatên xwe û zehmetiyên pîşeyê nêrînên xwe anî ziman.

Coşkundemîr, diyar kir ku wekî wardiya û nobedarî hemûhemşîre di nav hefteyê de 45 seatan dixebitin. Coşkundemîr, got ku qanûna tarîfa pîşeya hemşîretiyê dike hate qebûlkirin û wiha got: "di qanûnan de hate qebûlkirin lê rêzika pratîzekirinê hê jî derneketiye. Her wiha pîşe hatiye tarîfkirin. Li gorî tarîfê hemşîre divê li gorî gotina doktoran nexweşan tedawî bikin."

**Dibin wezîfedarên depoyan jî**

Hemşîre Nurşen Coşkundemîr, da zanîn ku gelek caran li gorî wê tarîfê hemşîre nayên wêzîfedarkirin. Çoşkundemîr, destnîşan kir ku gelek caran hemşîrê dibin dermanfiroş, îstatîstîkvan û wezîfedarên depoyê. Coşkun, diyar kir ku ji bilî tedawî û xwedîkirina nexweşan bi hemû belgeyên nexweşan re jî mijûl dibin. Coşkundemîr di beşa onkolojiyê de dixebite, lê ji bilî hemşîretiyê bi karê teknîkê re mijûl dibe û karê fermî dike û wiha axaftina xwe dom kir: "Karê ku min hejmart ne karê ku em bikin. Lê ji bo ku nexweş zirarê nebînin em hemû karan jî dikin. Hikûmet bi navê 'di tenduristiyê de guhertin' hîn qanûn guhertin. Wekî doktorên malbatê. vê yekê li ser pîşeya hemşîreyan bandorê kir. Her wiha nexweşxaneyên ku nexweşan wekî muşterî dibînin û nexweşxaneyên wekî kargehên tîcarî dinirxînin hemşîreyan jî wekî personel dibînin. Di nexweşxaneyên taybet de pere li gorî performansê tê dayîn û reqabeteke mezin derdixin holê."

Coşkundemîr, di axaftina xwe de bal kişand ser bernameya guherandina tenduristiyê û got ku ji ber vê pergalê tedawîkirina nexweşan her diçê zehmet dibe. Coşkundemîr, daxuyand ku di gelek rewşan de hemşîre rastî şîdeta malbatên nexweşan jî tên.

Rêvebera Şaxa SES'ê ya Îzmîrê Coşkundemîr da zanîn heke bersiva malbatên nexweşan neyê dayîn, hemşîre rastî şîdeta fîzîkî û psîkolojîk tên.

Hemşîre Nurşen Coşkundemîr bi xwesteka xwe pîşeya hemşîretiyê hilbijartiye û ligel hemû zehmetiyan ji karê xwe gelekî hez dike.



Nurşen Coşkundemîr

## Di Roja Hemşîreyan de qordeleyên reş

Hemşîreyên ku bi boneya Roja Hemşîreyan li ber Nexweşxaneya Mêrdînê ya Dewletê hatin cem hev qordeleyên reş bi xwe ve kirin û bi qordeleyên reş bûyera gundê Zankirtê şermezar kirin û bertek nîşan dan.

Rêveberên şaxa ÎHD'a Mêrdînê, şaxa Egîtim Sena Mêrdînê, serokê Komeleya Hezkiriyên Hawirdorê ya Qoserê Memduh Çakar, Serokê Belediye Îşa Şaxa Mêrdînê Memduh Ozturk, Serokê Giştî yê SES'ê Dr. Bedriye Yorgun û gelek kesan piştgirî da daxuyaniya hemşîreyan ku bi boneya 12'ê Gulanê Roja Hemşîreyan li pêşiya Nexweşxaneya Mêrdînê hatibûn cem hev. Di daxuyaniyê de qordele û dowîzên reş hatin bikaranîn û pankarta 'Bila zêdetir jin û zarok neyên kuştin bila cerdewanî bê rakirin' vebû.

Rêvebera şaxa SES'a Mêrdînê Denîz Aslan li ser navê girseyê daxuyanî xwend û anî ziman ku ne ji ber krîza aborî ji ber bûyera gundê Zankirtê qordeleyên reş bi xwe ve kirine. Aslan anî ziman ku hê jî li herêmê pirsgirêk çareser nebûne û qetliamên jinan pêk tên û wiha got: "Herî dawî li gundê Zankirta girêdayî Şemrexa Mêrdînê jin, zarok û jinên ducanî hatin kuştin û qetlimek pêk hat. Beriya her kesî wekî xebatkarên tenduristiyê, me mudaxaleyî bûyerê kir û hê jî me tesîra derûniyê ya bûyerê ji ser xwe neavêtiye. Sedema vê wehşetê ew e ku çek didin kesên ku nizanibin ji bo çi, kengê û çawa wî çekî bi kar bînin. Ev wehşet edaleta hêzen çekdar, misyona cerdewaniyê nîşan dide."

Denîz Aslan diyar kir ku divê demildest cerdewanî bê rakirin û di vê mijarê de rayedar vexwendin ser kar. Piştî axaftina Aslan Seroka Giştî ya SES'ê Bedriye Aslan axaftineke kurt kir û pêkhatina bûyereke wisa bi çekên dewletê şermezar kir. **MÊRDÎN / DÎHA**

## 120 mexdûrên şîdetê serî li navêndê da

120 jin di nava 8 mehan de serî li 'Ji şîdetê re na' ya Navenda Piştevanî û Şêwirmendiya Hiqûqî ya Jinan a Meclîsa Jinan a Konseya Bajar a Yerel Gundem 21'ê daye.

Meclîsa Jinan a Konseya Bajar ya Yerel Gundem 21 faaliyeta 'Ji şîdetê re na' ya Navenda Piştevanî û Şêwirmendiya Hiqûqî ya Jinan a 8 mehan bi daxuyaniyeke çapemeniyê aşkera kir. Li ser navê Meclîsê rêvebera projeyê Muzeyen Akinci daxuyanî da. Akinci, diyar kir ku di meha îlona sala 2008'an de dest bi xebata projeyê kirine. Akinci destnîşan kir ku ofîsa projeyê her roj vekirî bû û tenê dawiya hefteyê bi telefonê xizmetê dane. Akinci, da zanîn ku 8 meh li ser projeyê derbas bû û wiha axaftina xwe dom kir: "Di nava 8 mehan de 120 jinan serî li wan daye û alîkarî xwestine. Ji sedî 97 jin bi şîdeta fîzîkî, devkî, derûnî, cinsî û aborî re rû bi rû mane. Alîkariya hiqûqî dane 120 jinan. 12 jin bi alîkariya navendê doz vekirine. Doz di çarçoveya berdan, xweparastin û kuştina bi hinceta namûsê de hatine vekirin. Di nava wan dozan de 2 doz jî dozêna ensestê ne." Akinci, destnîşan kir ku dê di pêşerojê de der barê projeya 'Ji şîdetê re na' de agahiyên berfirehtir bên dayîn. **AMED**



Muzeyen Akinci

## Jinên Helepçeyê hîn jî reşpoşiyê girêdidin

Dayikên Helepçeyê hê jî cilên reş li xwe dikin. 21 sal berê Rejima Baas li Helepçeyê 5 hezar kes kuştin û bi hezaran jî birîndar kirin. Zarokên ku di wê demê de biçûk bûn niha mezin bûne û fem dikin ka çima dayikên wan cilên reş li xwe dikin.

Hemîdê 32 salî li bazara Altun ya Helepçeyê cil û bergên jinan difiroşe. Hemîd dibêje: 'Kêfa min ji cilên reş re tê û her cilên reş li xwe dikim. Reşpoşî li vî bajarî, bi wê çîroka tehl û trajediya ku hatiye serê xelkê bajêr ve girêdayî ye."

Karesat û malwêraniyê ewqasî jinên bajêr di nav cilên reş de veşartiye, niha ew bi xwe jî bawer dikin ku dilê wan bi vî rengî geş dibe. Hinek ji jinên bajarê Helepçe vê reşpoşiyê wekî peyameke wefadariyê ji bo rihê şehîdan dibînin.

**Reş rengê şînê ye**

Dilniya Mihemed, 25 salî ye û li kolanên bajêr bi çend cîranên xwe re rûniştiye, ji xwe re behsa dinyayê dikin. Dilniya diyar dike bêyî ku sedema wê bizane kêfa wê ji cilên reş re tê. Her wiha da zanîn ku hemû cilên wê yên malê jî reş in. Jineke din axaftinên Dilniya bi sedemeke din a reşpoşiyê dewlemend dike û didomîne: "Piraniya xelkê bajêr hejar in û nikarin her roj rengekî li xwe bikin. Lewre ji ber cilên reş ligel rengên din diguncin, piraniya xelkê cilên reş dikirin. Her wiha reş rengê şînê ye jî."

Li piraniya bajar û bajarokên Kurdistanê ew jinên ku kesên xwe yên xoştivî winda dikin, di dema şînê de cilên reş li xwe dikin. Gelek caran jî reşpoşî heta dawiya temenê wan didome. Di dema ciwantiyê de meta Fatîme ku tenê çarikeke reş dida serê xwe, lê niha temenê wê bûye 52 salî, piştî mirina hevserê xwe reş girêda û her çar werzên temenê wê bûne payîz wiha axaftina xwe dom kir: "Piştî mirina zilamê xwe min hemû cilên xwe kirin reş, ji niha û pê ve nikarim rengekî din li xwe bikim."

**Cilên reş gelek têne firotin**

Li gor Beşdar Selîmê dikandar rengê reş rengekî xweşîk e û pirê caran jê re tê gotin cilên reş gelekî li te tên. Beşdar 24 salî ye û ligel piraniya wan ciwanan hevra ye û bi baweriya wan êş û janên Helepçeyê, bi dirêjahiya dîrokê nehiştiye bajar ligel rengên din pêwendiyan girêbide.

Ekrem Osman jî xwediyê dikana cilên jinan e. Ekrem wiha axivî: 'Piraniya mişteriyên me cilên reş dikirin. Li vî bajarî cilên reş pir tên firotin. Sedema wê jî ew karesat û bûyer in ku ji salên heftêyî ve heta niha hatine serê xelkê bajêr."

Pisporên bi warê derûnî bi awayekî din rengê reş rave dikin û dibêjin diyartirîn sedema reşbîniyê ye. Di vê derbarê de pisporê derûnzaniyê Awat Nesrulla got: "Zêdebûna reşpoşiyê li Helebçê ew e daniştvanên bajêr li beramber jiyan û pêşeroja xwe reşbîn in. Mirov dikare civakê bi cil û bergên wan bixwîne."

Bi baweriya pisporê navborî, sedemeke din a reşpoşînê li bajêr bandora ferhenga Îranî ye. Ji ber ku Îran nêzîktirîn sînor e li devera Helepçeyê. Der barê bandora rengê reş de li ser meseleyên derûnî jî Awat Nesrulla wiha dirêjî da axaftina xwe: "Bêguman bandora rengê reş heye. Reşpoşîn kesan westiyayî û dilteng pêşan dide. Ez ê pireke Londonê wekî mînak bidim ku rengê wê reş bû, xelkê bajêr fêr bûbûn diçûn ser wê pirê xwe diavêtin û xwe dikuştin. Lê piştî rengê pirê guhertin kesî nedît hinek xwe bavêjin xwar." **HELEPÇE** *(Rûdaw)*



Piraniya jinên Helepçeyê cilên reş li xwe dikin. Ji bo wan rengê reş rengê şînê ye.

## Li ser menopozê bandora cigareyê zêde ye

Li gorî pisporan cigare li ser menopozê bandoreke neyînî dike. Divê jin di vê mijarê de baldar bin. Endamê Beşa Zanyarî ya Welidînê û Nexweşiyên Jinan a Zanîngeha Stenbolê Prof. Dr. Faruk Buyru, bal kişand ser cigareyê û nexweşiya menopoza zû. Prof. Dr. Buyru, diyar kir ku cigare li ser hêkan gelek bandoreke neyînî dike û wiha axaftina xwe dom kir: "Jinên ku cigarê dikişînin zûtir menopoz dibin. Kalîteya hêkan bi temenê re girêdayî ye. Piştî 37 salî welidîn gelekî zehmet e. Tedawiya bebeka tup jî gelekî zehmet e. Her wiha cigare li ser menopozê gelekî bandorê dike. Ji ber vê sedemê divê jin dest ji kişandina cigareyê berdin. **STENBOL**

www.arsivakurd.org

Hawar
14 Gulan 2009
Pêncşem

## Kuxikek an jî 20 hezar vîrus

Dema ku mirov carekê dikuxe an jî dibêhnije 20 hezar vîrus li der û dorê belav dibin. Pisporên sîngapurî di lêkolînekê de encamên balkêş bi dest xistin. Pisporan diyar kir ku dema ku mirov carekê dikuxe 3 hezar zere û bi van re jî 20 hezar vîrus belav dibin. Bi vê yekê jî rîsk heye ku bi taybetî kesên ku derzî li xwe nedane nexweş bibin. Pisporan diyar kir ku ev madeyên belav dibin li hewayê dimînin û mirovan nexweş dixin. Ji ber vê yekê jî pispor dibêjin dema ku mirov dikuxe divê devê xwe bigire. HONG KONG



# Di bin şertên giran de dixebitin

**Kurdên koçber li her derê di bin şert û mercên giran de dixebitin. Li Seyhanê karkerên kurd ên ku komira daran çêdikin dibêjin ji ber ku her tim di nava tozê de ne bi gelek nexweşiyan re rû bi rû dimînin**

Li gundê Golbaşiya bi ser navçeya Seyhana Edeneyê karkerên ku darên porteqalê dişewitînin û komira daran (komira manqelê) çêdikin di bin şert û mercên giran de dixebitin. Karkerên komirê hemû kurdên koçber in û dibêjin ji ber ku alternatîfa wan nîn e, ew di vî karî de dixebitin. Ev kar bûye pîşeya wan.

Li Kurdistanê ji ber şer û pevçûnan gelek gund hatin valakirin. Valakirina gundan û pergala cerdevaniyê bi xwe re betaliyek jî anî. Kesên ku ji ber xizaniya di encama betaliyê de derketiye holê, ji welatê xwe koçî bajarên tirkan ên weke Edeneyê kirine. Kurdên ku koçî Edeneyê kirine di bin şert û mercên giran de dixebitin. Ji wan qadan yek jî hilberîna komira daran e.

**15 sal in dixebite**

Welatiyê bi navê Esat Soylemez diyar kir ku wî di sala 1993'an de bi malbata xwe re koçî Edeneyê kiriye. Ji ber alternatîfa wî nîn e ev 15 sal in di karê komirê de dixebite ango karkerê komirê ye. Wan bi malbata xwe re li qeraxa ocaxê komirê kon vedaye. Bi 3 zarok û hevserê xwe re di kon de dijî. Serê sibehê heta êvarê jî bi malbata xwe re dixebite.


Soylemez der barê mijarê de wiha axivî: "Em dara porteqalê diweşitînin û bi vî rengî komira manqelê derdixin. Di serî de daran berhev dikin û kom bi kom datînin. Piştre axê davêjin ser daran û ser wan digirin. Li jora daran kulekekê vedikin. Di binî de jî ciheke ku hewa bigire dihêlin û piştre jî agir pêdixin. Ev agir divê ji jêr ber bi jor hêdî hêdî pê bikeve. Ji ber vê yekê jî em her tim agir dişopînin. Ev kar nêzî 2 hefteyan didome. Agir dema ku dadikeve binî em bi naylonan ser agir digirin û nahêlin hewa bigire. 4-5 rojan jî bi vî rengî dihêlin. Agir bi vî rengî hêdî hêdî vedimire.

Soylemez diyar kir ku heke agir baş neyê pêxistin û kontrolkirin wê demê dê hemû darên derûdorê bişewitin. Ji ber vê yekê jî ew bi şev û roj dixebitin û nobetê digirin.

Soylemez got ku karê wan giran e û her tim toza komirê dadiqurtînin. Ji ber vê yekê jî ew bi nexweşiyên weke made, pişik û bêhntengiyê re rû bi rû dimînin.

**Bi şev û roj dixebitin**

Welayitê bi navê Yilmaz Bagiş jî diyar kir ku 12 sal in vî karî dike û wiha axivî: "di vî karî de ya herî giran nobeta bi şev û roj e. Ji ber ku heke ahenga agir xira bibe hemû keda me dê bi hewa biçe." Bagiş diyar kir ku komira daran di mehên adar û tîrmehê de tê hilberandin û li gorî sezonê ye. Bagiş got ku ew tona dara porteqalê bi 130 TL'î dikirin û piştî ku komirê çêdikin, wan tijî çewalan dikin û difiroşin. EDENE / DÎHA



## Sewaleke nû hate dîtin

Zanyaran li Edeneyê bi tesadufî sewaleke nû dît. Çavên wî tune ne û di bin erdê de dijî. Zanyarên Zanîngeha Trakyayê diyar kirin ku wan giyaneweke nû kişf kiriye û navê wî kirine "Niphargus Kirgizi." Zanyaran diyar kir ku wan ev sewala nû li zozanên navçeya Pozantiya Edeneyê dîtiye. Ev sewal bi tesadufî dîtine û tenê di bin erdê de dijî, dirêjbûna wî 2 santîm e û çavên wî tune ne. Zanyaran diyar kir ku der barê vî giyanewerî de tu agahî nîn in û ji ber vê yekê jî divê lêkolîn bê kirin. Her wiha zanyaran der barê vî sewala nû de gotarek jî nivîsandiye û gotara wan di kovareke zanistî ya almanan de hatiye weşandin. Dîsa ev giwanewer weke sewaleke nû hatiye qebûlkirin. EDENE

## Riyên navçeyê tên çêkirin

Şaredariya Silopiyê ji bo çêkirina rê û peyariyên navçeyê xebat da destpêkirin. Di çarçoveya projeyê de rê û peyariyên gelek tax, cade û kolanan hatin çêkirin. Şaredarê Silopiyê Emîn Togurlu li taxên Cumhuriyet, Nuh, cadeya Demîrel, Onur û li kolana Cîhanê xebat kontrol kirin. Her wiha Şaredar Togurlu bi şêniyên taxan re jî sohbet kir û nêrîn û pêşniyarên welatiyan girt. Togurlu diyar kir ku nêrînên gel ji bo wan girîng in û ew ê biryarên xwe bi gel re bigirin. ŞIRNEX



## Cilên neteweyî hatin pêşandan

Li hola muzaxaneya Sîktona ya navçeya Sîktonaya bajarê Stockholma Swêdê, navenda Destkirda Kurdî bi alîkariya televîzyona herêmî ya Silêmaniyê, civata çandî ya Swêdê, şaredariya navçeya Sîktonayê û Komeleya Têkel ya Çandan a li Swêdê cil û bergên neteweyî hatin pêşandan. Di pêşangehê de şaredarê navçeya Siktonayê, nûnerê balyozxaneya Iraqê , rêveberê mûzexaneya wê navçeyê, hejmarek ji xelkê Swêdê amade bûn. Di axaftinê de Şaredarê Sikotnayê kêfxweşiya xwe nîşan da ku di nav sînorên şaredariya wî de karekî çandî yê kurdî tê kirin û pêşangeh wekî karekî hêja nirxand. STOCKHOLM *(pukmedia)*

## Cigare xewê diheriminê

Cigare û araq xewa mirovan diherimîne. Ji ber vê yekê jî pispor dibêjin ku 5-6 saet beriya razanê divê mirov xwe ji cigare û araqê dûr bigire.

Pispor diyar dikin ku xew parçeyeke jiyana rojane ya mirovan e. Ji bo tenduristiya zîhnî û fîzîkî tiştekî girîng e û mirovan zindî dihêle. Bêxewî dibe sedema qezayên trafîkê û yên kar ji ber vê yekê jî pirsgirêkeke gel e. Pispor diyar dikin ku divê dema xewa mirovan hat rakevin û xwe nedin zorê. Der barê vê mijarê de wiha tê gotin: Heke xewa mirov neyê divê nekeve nava nivînan. Saetên xewê divê neyên guhertin. Di rojên betlaneyê de jî divê mirov di heman demê de rakeve an jî rabe. Ji bilî van pêşniyaran jî pispor dibêjin ku odeya razanê divê bêdeng be û zêde ronahî lê tune be. Her wiha divê zêde germ an jî sar jî nabe. Heke xewa we bi şev neyê divê teqez di nava rojê de ranekevin. Cigare û araq ji ber ku zirarê didin mirovan nahêlin mirov bi rehetî rakeve. Beriya razanê xwarin divê neyê xwarin. Ji bilî vê jî bi awayekî bi rêk û pêk divê spor bê kirin. AMED

## 35 sal in serê xwe naşo!

Li Hindistanê bûyereke ku mirovan matmayî dihelê qewimî. Hindûyekî bi navê Kailash Singh ev 35 sal in serê xwe qet neşûştiye. Sedema vê yekê jî bawariyeke balkêş e.

Hindûyê bi navê Kailash Singh 63 salî ye û 7 keçên wî hene. Lê ew dixwaze kurekî wî hebe. Tê gotin ku ji bo kurê wî çêbibe 35 sal in qet serê xwe naşo. Ji bo ku kurê wî çêbe çûye gelek perestgehan û pir dua kiriye. Herî dawî jî kahinekî jê re ev pêşniyar aniye. Kahîn jê re gotiye heke ew serê xwe qet neşo dê kurê wî çêbe. Ew jî ev 35 sal in li benda kurekî ye. Li gorî nûçeyên ji çapemeniya Hindistanê hatine girtin Kailash Singh ji bo ku xwe ji bakterî û mîkroban biparêze êvarê agir pêdixe û li ber agir li ser piyan disekine. Bi vî rengî li benda mirina bakterinyan dimîne. Her wiha tê gotin ku ew ketiye çemê Ganjê jî lê piştî ku birayê wî jiyana xwe ji dest daye dev ji vê yekê berdaye. Di nûçeyên ku di çapemeniya Hindistanê de hatine weşandin de tê gotin ku Kailash Singh berê dikandar bûye. Lê ji ber ku bêhneke nexweş jê dihat kesek neçûye dikana wî û ew jî mecbûr maye dikana xwe bigire. DELHÎ

www.arsivakurdi.org